


Azadîa rastî çi ye?

[Mebesta vê parçê “Jîn” eve ye: min divêt hindek têbînîa bidim we da hîn pitir azadîa rastî nas kin.]

Li vê dumahîê gelek kes li ser dîmokrasiê diaxivin.

Her komelekê hindek azadîa rastî yê hey. Komela Kurda jî hindek azadîa rastî hene, bes hêş maî ye.



Dîmokrasiê pişkekê jî azadîa rastî ye. Belê azadîa rastî çi ye? Bi kar îana dîmokrasiê rastî, ewe ku Xwidê xêr daîme, çunku her kesekê li ser dinyaê Xwidê xêrek digel kirî ye – u pêtivî ye her êk ji me ew xêra Xwidê daîye bi kar bînîn digel êk u dû. Belê pêtivîê em bizanîn ka çawa wê azadîa rastî bi regekî berfire kar bînîn.

Bu numune, Xwidê xêr li gel min kir u ez fêrî zimanê Kurdî bim u bibime mamosta. Bu min gring e ez xizmeta xelkê bikim da ez wê xêrê kar bînim u harî karîa xelkê bikim. U da şerim bit bu min heker ez wê xêrê bu xizmeta xelkê bi kar neînim u bu xu bi tinê bihêlim. U ji ber hindê min çend kitêbê Kurdî nivîsîne da xelkê xerîb bişên Kurdî fêr bin u harî karîa Kurda bikin.

Her êk ji we pêtivî ye bawerî bi xu hebit u xêrê bu êk u dû bixazin. Ne bes bi axiftinê. Bi karî. Çunku her kesekê tiştêkê taybet heye u pêtivî ye ew tiştê taybetîe xizmeta kesê dî bikit.

Dîar bike azadîa rastî bi karê xu ew xêra Xwidê daî te. Bi karê xu yê baş tu dê gehî azadîa rastî u dê bînî ka çawa tête bikar înan. U pişkek azadîa rastî hebit.

“Amujgarîê nîşa zanaekê bide. Dê zanîyarîêt wî pitir lê êt. Yê rastgu fêr bike dê zanînin wî pitir lê êt.”

- (Pertuka Gutinê Pêxember Silêmanî 9:9)